# FERHENG
# Laş, seksualîte û sihet

## Kurmancî

ORDLISTA
Kropp, sexualitet
& hälsa

rfsu

# FERHENG
# Laş, seksualîte û sihet

**Naveroka vê ferhengokê gotinên di derbarê seksê de, hevjîyanê, tenduristî û mafan de ye. Gotin di derbarê laş, his, têkilî, seks, nasnav, sihet û qanûnan de ne. Bi destxistina van agahiyan mafek e.**

| GOTINÊ SWÊDÎ | WERGER | ŞIROVE |
|---|---|---|
| Abort | Jiberxwekirin, kurtaj | Gava mirovek ducanî/bi hemile û zarokê naxwaze, ew mirov dikare li nexweşxanê zarokê ji ber xwe bigire. Piştî wê êdî ew mirov ne bi hemil e. |
| Adoption | Lêmiqatebûn. Ewladkirin | Gava yek an çend kes berpirsiyariya zarokekî/zarokekê hildigire. Ew hingî ji zarokê re dibin dê û bav. |
| Akut p-piller | Heba lezgîn ya li dij avisbûnê | Ev hebeke weha ye ku piştî têkilyeke cinsî ya bêyî xweparastin bi sê heta pênc rojan tê girtin da rê li ber bihemilbûnek nexwestî bigire. |
| Anal | Qula qûnê, zotik | Qula qûnê, zotik. Wek *anus* jî tê zanîn. |
| Analsex | Nîhandina qûnê | Têkiliya cinsî ya li der û dora qûnê an jî ji qûnê. Wek nimûne bi tiliyan, bi zimên, bi lîstokên seksê an jî bi kîr (penîs). |
| Androlog | | Doktorê ku pisporê kîr û gun e. Androlog pisporên fonsiyon û nexweşiyên organên cinsî ne. andrologek herweha dikare ber-sivên di derbarê seksê de jî bide. |
| Asexuell | Aseksuel | Yekî/yeka ku an daxwaza seksê li ba tune, an pir hindik heye, an jî naxwaza seksê bi hinin din re bike. |
| Assisterad befruktning | Alîkariya bihemilbûnê | Gava karmendên tenduristiyê alîkariyê pêşkêşî yekê an jî cotekî dike ku dixwaze avis bibe lê bêyî alîkarî nikare. Nimûneya biberbûna bi alîkarî biberkirin û IVF. ye. |
| Avbrutet samlag | Têkiliya cinsî ya qutbûyî | Gava mirov di têkiliya cinsî ya vajînal de xwe digire û nahêle avik di quz de were lê belê li derveyî quz berdide. |

| GOTINÊ SWÊDÎ | WERGER | ŞIROVE |
|---|---|---|
| Bakteriell vaginos | Mîqrobên vagînos | Herikînên bêhngenî ên ji vajîna (quz) diherikin. Mîqrobên vagînos tê wê maneyê ku di quz de bêbalansieyeke mîqobî heye. |
| Balanit | Kulbûna çermê kîrî | Îltihabek di gupika kîr de ku dike çerm sortir bibe, hin pizikên sorik xwe didin der, dike ku hem gupik, hem jî çermê bin biêşe û bijene. |
| Barnavårdscentral | Navenda tenduristiyê ya zarokan | Navendeke ku kontrola tenduristiyê ya zarokên biçûk dike, wan vaksîn dike û şîretmendiyê dike. Ew pêşwaziyê zarokên nûçêbûyî û heta ew dest bi pêşdibistanê dikin. Herweha jê re dibêjin *BVC* jî. |
| Barnmisshandel | Îstismara zarokan | Gava şidet li zarokek di binê 18 salî re tê kirin, mafê zarokê tê binpêkirin, an jî ji aliyê dê û bav û an jî mezinekî din ê berpirsiyar ve lê xwedî nayê derketin. Li Swêdê lêdana zarokan bêqanûnî ye, ji bo dêûbavan jî, armanca terbiyekirinê çi dibe bila bibe. |
| Barnmorska | Pîrik, ebe | Bi lênêrîna zarokanînê, tenduristiya dayiktiyê û seksê, alavên dijavisbûnê û şêwra kurtajê re dixebite. |
| Barnmorske-mottagning | Pêşwaziya pîriktiyê | Gava mirov bihemil e, mirov diçe vî cihê pêşwazîkirina bihemilan. Li vê klînîkê di hemû dema avistiyê de mirov kontrol dike û li tenduristiya mirov miqate ne. Herweha ji vir re dibêjin *Navenda lênêrîna dayiktiyê an MVC.* |
| Barnporno-grafibrott | Sûcê pornografiya zarokan | Ev sûcekî welê ye, yê ku wêneyê naşiyekî/naşiyekê, an jî ên di bin 18salî re bi armanca seksê û pornografiyê digire, li ba xwe diparêze, belav dike, an jî difiroşe. |

| GOTINÊ SWÊDÎ | WERGER | ŞIROVE |
|---|---|---|
| Barnäktenskap | Zewaca zarokan | Zewaca ku yek ji cotan di bin 18 salî re ye. Li Swêdê destûra zewaca bi zarokan re tuneye. |
| BB | Klînîka zarokanînê | Devera ku mirov piştî anîna zarokê bi çend rojan dikare lê bimîne. |
| BDSM | BDSM | Kurtkirina esaret û disiplînê, serdestî û bindestiyê (xwebiçûkxistin) û sadomazoşîmz jî tê de. Li ser lihevkirinê tê avakirin. |
| Befruktning | Meyandin, dolkirin | Gava avik û hêkik di kanala hêkikê de digihên hev. Ew hingî dikare bibe embiryoyek û têkeve riya malzarokê. |
| Binda | Paçik | Parastineke ku di dema ade/mensê de nahêle xwîn biherike. Ev paçikê ha bi derpîkê binî ve tê vekirin. |
| Bisexuell | Bîseksuel | Yekî/yaka bîseksuel dikare evîndarî herdu cinsan bibe û bixwaze bi herdu cinsan re seksê bike. |
| Bitestikel | Hêkên gun | Beşek ji organên cinsî ên hundir heke kîrê mirov hebe. *Hêkik* di gun de hene. |
| Blottning | Nîşandana organê xwe ê cinsî | Gava yek organê xwe ê cinsî li ser înternetê nîşan dide an jî di rastiyê de nîşanî hinan dide da wê/wî tacîz û bêhizûr bike. Bi zimanê hiqûqî jê re *tacîzkirinên seksî* tê gotin. |
| Blygdläppar | Lêvên quz | Li dora quz, zîlik (klitoris) û mîzokê ye. Lêvên quz ên derveyîn û hundirîn hene. |

| GOTINÊ SWÊDÎ | WERGER | ŞIROVE |
|---|---|---|
| Bröst | Memik | Memik di sînga mirov de ye. Memik ji tevna bez û organa şîrî pêk tê. |
| Bröstvårtor | Serê memikan | Giroverkek ku di nîvê memikê de ye û xwe hinekî ji memikê dide der. Li dorhêla serê memikê jî xelekek haye. |
| Bög | Gay | Ji bo mêrên homoseksuel gotineke adetî ye. |
| Cellprovtagning | Tahlîla hucreyan | Ev tahlîla ha ji bo ku mirov bizanibe ka guhertinek ku dikare bibe sedema kanserê di malzarokê de çêbûye an na. |
| Cysta | Kîst | Nepoxkeke/pifdankeke tijî av e ku dikare ji gelek organên laşî ve were, herweha ji hêkikan jî. |
| Dejta | Têkildarî | Hevdîtina yekî/yekê ji bo mirov pê re bide û bistîne, pê re seksê bike, an pê re bimîne. |
| Diskriminering | Cûdakarî | Gava mirov ji bo cinsiyeta xwe, ji bo meyla xwe ya cinsî, ji bo nasnava xwe ya cinsî, ji bo dînê xwe, ji bo koka xwe, ji bo temen an ji bo astengiyên xwe ên hişmendî û laşî pêrgî neheqiyan tê. Li *dîtina sûcên nefretê, homofobî, transofobî, nijadperestî, funkofobî, seksîzîm, yekpîvanî û wekhevî* binêre. |
| Embryo | Embrîyo | Gava avik û hêk digihên hev û hêk biber dibe, *embrîyoyek* pêk tê. Ji vê re dibêje biber bûn. Paşê embrîyo di malzarokê de digihê û dibe pitik ku paşê dibe zarok. |
| Endometrios | Endometrios | Gava (mukosa) ji malzarokê li derveyî malzarokê mezin dibe, bi gelemperî di hêkik, an di dîwarê zik de. Bi taybetî di dema jin dikeve kirasan (dema mensê) *Endometrios* dikare êşeke giran bide. |

| GOTINÊ SWÊDÎ | WERGER | ŞIROVE |
|---|---|---|
| Engångsligg | Carek | Gava mirov tenê carekê bi yekê/yekî re seksê dike. |
| Ensamstående | Bi tenê | Dêûbavên ku têkiliyeke wan ya evîndariyê bi hev re tuneye. |
| Erektil dysfunktion | Xerabûna fonksiyona ereksiyonî | Bi zehmetî kîr radibe û gava radibe zehmet e ku rabûnê biparêze. Herweha gava daxwaza seksî bi mirov re hebe jî. Jê re *erektionssvik jî tê gotin.* |
| Erotik | Erotîk | Wêne, tablo, edebiyat an jî fîlmên bi şehwet û daxwazên seksî. |
| Ex | Yê/ya berê | Yekî/yeka ku mirov berê pê re dijiya lê niha ne pê re ye. |
| Fetisch | Fetîş | Gava alavek/tiştek an beşekî laş ku mirov bi gelemperî wek tiştekî seksî nabîne, daxwazek mezin ya xweşiyê, balkêşiyek seksî û şehwetê ava dike. Wek nimûne ling û çerm. |
| Fitta | Quz | Organa jinê ya cinsî. Gotina quz hemû organa jinê ya cinsî tarîf dike, hem beşên hundirîn hem ên derveyîn. |
| Flickvän | Keçika heval | Keçikeke ku têkiliyeke mirov pê re heye. |
| Flirta | Baldayîn | Gava mirov bala xwe berdide ser yekî/yekê ku mirov jê hez dike, dixwaze pê re bibe heval û pê re razê (pê re sekse bike.) Jê re *anî ser rê* jî tê gotin. |
| Flytningar | Herikîn | Ew avika ku ji quz diherike da quz paqij û bisihet bihêle. |

| GOTINÊ SWÊDÎ | WERGER | ŞIROVE |
|---|---|---|
| Foster | Pitik | *Pitik* embiriyoyek e ku di malzarokê de neh hefteyan mezin bûye gava mirov avis e. |
| Fostervattenprov | Tahlîla ava dolê | Tahlîlek e ji bo bizane ka tu xeletiyên kromozomî di dolê de heye an na. |
| Framfall | Hatina ji pêş | Tiştekî di quz de, an di devê quz de tewiyaye. Wek nimûne dikare rêgehên quzî bin, malzarok be, kîsikê mîzê be, an jî roviya dawî be ku daketibe jêr. |
| Frenulum | Frenulum, benik | Çermê di navbera gupika kîr û qevda kîr de ye. Jê re sträng (*benik*) jî tê gotin. |
| Frivilligt sex när förövaren är nära 15-årsgränsen | Seksa bi daxwaz gava tawanbar li dor 15salî ye. | Ji ber temenê biçûk û ferqiyeta temen, divê eseh be ku ew têkilî ji dil be û ne destavêtin û tecawiz be. Hingî ê ku ew kiriye wê neyê cezakirin. |
| Funkofobi | | Helwest, nêrîn û hisên neyênî ên li dijberî mirovên bi asteng, bo nimûne dijberî mirovên di erebokan de, mirovên kor û kerr. Herweha mirovên ku nexweşiyên wan ên berdewamî hene, wek nexweşiya HIVê. |
| Förhud | Çermê kîrî | Perdeka çerm ya li ser gupika kîr an zîlika quz e. |
| Förhuds-förträngning | Tengbûna çermê kîrî | Gava çermê ser teng e û bipaş ve nakişe serê kupika kîr. Ew çermê ser carina bi binê gupikê ve jî dizeliqe, û hingî ne bi pêş ve ne jî bi paş ve tête kişandin. |

| GOTINÊ SWÊDÎ | WERGER | ŞIROVE |
|---|---|---|
| Förlossning | Zayîn | Zayîn ew e gava zarokek çêdibe. Zayîn dikare di riya quzî de an jî bi riya sezeryanê bibe. |
| Förlossnings/avdelning | Beşa zayînê | Ew beşa li nexweşxanê ku zarok lê çêdibin. |
| Förlossnings-depression | Depresyona zayînê | Depresyona gava zarok ji te re çêdibe. |
| Förlossningsrädsla | Tirsa zayînê | Tirs û endîşeya gava zarok dike çêbibe. |
| Förlossningsskador | Zerarên zayînê | Zerar û xisarên di dema zayînê de ku di quzî de çêdibin. |
| Förlossningsvärkar | Qolincên zayînê | Qolinc dest pê dikin gava malzarok ku ji masûlkan pêk hatiye ji xwe bi ser hev de dikişîne û zarokê ber bi jêr ve didewisîne da ew dakeve kanala çêbûnê ku zarok çêbibe |
| Försats | Avika pêşî | Ew şilahiya ku berî valabûnê ji ber şehwetê ji kîr tê. |
| Förtal | Buhtan | Gava di derbarê kesekê/kesekî de gotinên xerab û buhtan tên kirin da hinin din ji celebê jiyana wan hez nekin. |
| Glidmedel | Krema şematok | Ev kremeke welê ye ku di dema seksê de şematoktir dibe û dike ku seks xweştir bibe. Ev hem ji bo kîr, hem ji bo quz û hem jî ji bo qûnê tê bikaranîn. |
| Gnidsex | Boqandin | Seksa bi riya xwe li hev boqandinê dibe. Gava yek organa xwe ya cinsî dide ser ya yekî/yeka din û xwe lê diboqîne. |

| GOTINÊ SWÊDÎ | WERGER | ŞIROVE |
|---|---|---|
| Gonorré | Gonorê | *Gonorê* nexweşiyeke cinsî ye ku piraniya caran tu semtoman nîşan nade, lê gava mirov dimîze mirov dikare êş û şewatê his bike. Herweha dikare ji quz, kîr, an qûnê tîravek biherike, an jî mirov di jêra zik û gun de êşekê his bike. Gonoroyeke ku nehatibe tedawîkirin dikare çêkirina zarokê ji mirov re zehmettir bike. Tedawiya wê bi antîbîyotîkayê dibe. Gonorê daxilî qanûna parastina jihevvegirtinê ye. |
| G-punktsområdet | Herêma nixteya G | Herêmeke asê, piçekî di hundirê quz de, nêzîkî devê quz e. Li wê herêmê zîlik, boriya mîzê û dîwarê quz ê pêş digihên hev. |
| Gravid | Avis, ducanî | Gava dolek di malzaroka zik de çêdibe. Bi gelemberî avistî neh mehan dom dike. |
| Graviditetstest | Tahlîla avistiyê | Mirov tahlîleke weha dike ji bo mirov bizanibe ka mirov avis e an na. Ji bo tahlîlê mirov di qutîkek pîvanê de dimîze. |
| Grooming | Grooming | Gava mirovekî gihiştî bi riya înternetê dixwaze bi zarokeke di binê 15 salî re hevdu bibîne da pê re têkiliyeke cinsî deyne. Ev bêqanûnî ye. Di zimanê hiqûqî de dibêje *têkiliya bi zarokan re ya bi armanca seksê.* |
| Gruppsex | Seksa komî, seksa grûbî | Gava ji duduyan zêdetir kes di eynî kêliyê de bi hev re seksê dikin. |
| Gynekolog | Jinekolog | Doktorek ku pisporê quz û lêvên quz e. Jinekolog pisporê fonksiyonên organa cinsî, nexweşiyan û avisiyê ye. Jinekologek dikare herweha pirsên di derbarê seksê de jî bibersivîne. |
| Gynekologisk undersökning | Tahlîlên jinekolojiyê | Kontroleke quzî ya li nexweşxanê, li navenda tenduristiyê, an jî li navenda ciwaniyê dibe. |

| GOTINÊ SWÊDÎ | WERGER | ŞIROVE |
|---|---|---|
| Göra slut | Dawî lêanîn | Gava mirov dawî li têkiliyekê tîne. Gava mirov dawiyê li têkiliyekê tîne, mirov hingî êdî nema bi hev re ye. |
| Ha lust | Daxwazkirin | Dawxaza hiseke mezin ya kirina tiştekî. Carina gava mirov dixwaze seksê bike. |
| Hallick | Qewad | *Li qewadtiyê binêre.* |
| Hatbrott | Sûcê nefretê | Gava mirov yekî/yekê dike armanca kirinên sûcdariyê. Wek nimûne, tehdît an jî lêdan, gava mirov yê qurban bi armanca helwesta wî/wê ya seksê an jî cinsiyeta wî/wê, nijad, reng, bawermendî, an jî ji ber paxşana wî wê ya etnîkî û nijadî dike hedef. |
| HBTQ-person | Kesê HBTQ | Kurtkirina navên bîseksuel, homoseksuel, trans, an jî queer. |
| Hedersrelaterat förtryck och våld | Stemkarî û şideta namûsê | Gava bi gelemperî keçikek ciwan ji aliyê endamên malbatê û mirovên nêzîkî xwe ve bi armanca parastina namûs û şerefa malbatê tête kontrolkirin. Bi hiqûqî dikare bête maneya tehdîda bêqanûnî, şidet, zewaca bi zorê, kuştin û hwd. |
| Hen | Ew | Pronavek bêalî. Ew (hen) wek pronaveke cinsî ya bêalî, an jî gava balkêşiya cinsiyete tuneye. |
| Hepatit | Hepatît | *Hepatît* enfeksiyoneke kezebê ye, cûreyên cûda ên hepatîtê hene. Ya herî gelemper hepatît A, hepatît B û hepatît C ye. Sebeba hepatîtê vîrus e. |
| Herpes | Herpes | *Herpes* di devê mirov û organên mirov ên cinsî de tê. *Herpas* dikare pizik û birînan veke û dikare bixwire, bijene û pir biêşe an jî mirov qet his neke. *Herpes* pir bi hêsanî mirov dikare ji hev vegire. |

| GOTINÊ SWÊDÎ | WERGER | ŞIROVE |
|---|---|---|
| Heterosexuell | Heteroseksuel | Yekî/yeka heteroseksuel evîndarî cinsê hember dibe û dixweze pê re seksê bike. |
| Hiv | Hiv | *Hîv* vîruseke ku mirov dikarin ji hev vegirin. Bi nimûne bi nîhandina bêyî kondom an jî bi eynî derziya ku mirov li xwe dixe. Hîv parastina laşî birîndar dike. Heke hîv neyê tedawîkirin ew dikare derbasî aidsê bibe. ku kujer e. Gava were tedawîkirin hîv derbasî hinin din nabe. Herweha mirov bi aidsê nakeve û dikare mîna herkesî jiyaneke dirêj bijî. Hemû şêniyên Swêdê mafên wan heye ku xwe belş bidin kontrolkirin û tedawîkirin. |
| Homofobi | Homofobî | Helwesta neyênî, nêrîn û hîsa neyênî ya li dijberî mirovên bî û homoseksuel û bîseksueltî û homoseksuletiyê. Ev bi gelemperî xwe di pêşhukmiyê, nefretê, hêrsê, an jî şidetê de dide der. |
| Homosexuell | Homoseksuel | Mêrekî homoseksule dibe evîndarê mêran an jî dixwaze bi mêran re seksê bike. Jineke homoseksuel dibe evîndara jinan û dixwaze bi jinan re seksê bike. |
| HPV (humant papillomvirus) | HPV (Human papillomavirus infection) | Vîruseke pir belav e û bi celebên cihê ye. Hin ji celebê vîrusan dike ku di organên cinsî de pizik derkevin an jî bibin sebeba guhertinên hucreyî. Celebên din ên vîrusê dike ku di dest û lingan de pizik xwe bidin der. |
| HPV-vaccination | Aşiya HPV | Ev aşiya ha li dijberî hin celebên HPVyî ne ku dikarin bibin sebeba guhertina hucreyên devê malzarokê û ew jî bibe sebeba kanserê. |
| Hångla | Bihevşabûn | Gava laş nêzîkî hev in, hevdu maçîkirin, hemêzkirin û mistdan, bi kincan an tazî. |
| Ickebinär | Ne yek jê | Gava mirovek xwe ne wek mêr an jî wek jin dibîne. |



RFSU – FIGHTING FOR BODY RIGHTS SINCE 1933

| GOTINÊ SWÊDÎ | WERGER | ŞIROVE |
|---|---|---|
| Incest | Ensest | Gava yekî nêzîkî zarokê, istismara seksî bi zarokê dike. Ev dikare dêûbavek be, kalik be, an jî xwişkûbirayê mezin be. Bi qanûnî ev dibe tecawiza bi zarokan re, heke zarok di binê 18an re be, razana bi zarokên xwe re, an bi xwişk û birayên xwe re. |
| Infertil | Stewr | Gava yek nikare avis bibe û nikare kesin din avis bike. |
| Informationsplikt | Berpirsiyariya agahdarîkirinê | Gava yekî/yeka bi nexweşiyeke cinsî be, wek Hiv, klamidya an jî gonorê be, divê berî bi hinan re razê agahdariya nexweşiya xwe bide wan. Doktor parêzvantiya agahdarîkirinê dike, lê ew dikarin carina, di hin rewşan de nekin. |
| Inseminering | Aviskirin | Gava bi tibî avikê (sperma) di malzarokê de bi cih dike da avisiyê pêk bîne. |
| Intersexvariation | Varyasonên cinsî | Ev têgeha ha ji bo taybetmendiyên laşî ne ku mirov nikare bi awayekî hêsan li gora normên civatê diyar bike ka ew tîpîk mêr e an jin e. Varyason dikare di derbarê organên cinsî ên derveyîn an hundirîn be, û asta kromozom û hormonan be. |
| IVF | IVF (In vitro fertilisation) | IVF celebekî tedawiyê ye ku hêk ji laş tê derxistin û ji derveyî laş bi avikê tê meyandin. Ji hêkeke biberbûyî re tê gotin embrîyo. Çend rojan piştî biberkirin, doktor wê di malzarokê de bi cih dike. IVF wek fertîlîzasyona vîtro jî tê binavkirin. |
| Juridiskt kön | Cinsiyeta hiqûqî | Ew cinsiyeta ku di rehberê de hatiye diyarkirin, wek qeydkirin û di pasaportê de. |
| Jämlikhet | Wekhevî | Gava mirovên ji komên cihê mîna hev tên dîtin û pêşwazîkirin, û di formkirina jiyana xwe de û beşdariya civatê de xwediyên eynî mafan in. |

| GOTINÊ SWÊDÎ | WERGER | ŞIROVE |
|---|---|---|
| Jämställdhet | Yekpîvanî, wekhevî | Wekhevî ew e ku gava jin û mêr xwediyê eynî îmkanan e ku ew li ser laşên xwe û civakê xwedî eynî biryar bin. Ji bo ku jin û mêr di civatê de xwediyê eynî desthilatdariy bin divê ew xwediyê eynî îmkanan, eynî mafan û eynî berbirsiyariyan bin. |
| Kejsarsnitt | Sezeryan | *Sezeryan ew e ku doktorek qelîştekekê di navbera zik û malzarokê de dibire da ku pitikê ji malzarokê derxe.*scoate copilul. |
| Kirurg | Cerah | Doktorek ku pisporê emeliyatan e. |
| Klamydia | Klamidya | *Klamîdya* nexweşiyeke cinsî ye ku piraniya caran tu sîmtoman nîşan nade, lê gava mirov dimîze, dişewite û nerehetiye dide mirov. Herikînên guherî ji quz, ji boriya mîzê an jî ji qûnê an jî êşa binzik. Heke *klamîdya neyê tedawîkirin dikare bibe sebeba ku bi zorê zaro ji mirov re çêbibe. Mirov dikare bi antîbîyotîkayê tedawiyê wê bike û ew jî di qanûna parastina jihevvegirtinê de ye.* |
| Klimakterie | Zuhabûna jinan | Ew dema ku êdî dawî li kirasê jinê (mensê) tê. Bi gelemberî li dor temenê 50 salî. |
| Klitoris | Zîlik | Beşekî laş e ku bi quz ve ye. Hema li jora mîzokê ye. Derveyî zîlikê û gupika wê ji mistdanê re pir hesas e. |
| Klitoris ollon | Gupika zîlikê | Serî an gupika zîlikê ew beşa ku di laş de xwe dide der û diyar e. Ew ji bo mistdanê pir hesas e. |
| Knulla | Nîhandin, kutan | Gava mirov bi yek mirovî an bi pir kesan re seksê dike. |
| Knullkompis | Hevalê/hevala kutanê | Yekî/yeka ku têkiliyeke wan ya seksî heye lê pevgirêdaneke romantîk tuneye. Herweha bi kurtkirina KK jî tê zanîn û dişebe dost û dostiktiyê. |

RFSU – FIGHTING FOR BODY RIGHTS SINCE 1933

| GOTINÊ SWÊDÎ | WERGER | ŞIROVE |
| --- | --- | --- |
| Kondom | Kondom | Alavekî dijavisiyê ye ku ji lastîkê çêbûye. Mirov dikişîne ser kîr da ji bo pêşî li avisbûna bêdil û nexweşiyan bigire. |
| Kondylom | Kondylom | *Kondylom* nexweşiyeke cinsî ye ku di organê cinsî de belalûk derdikevin. Ew belalûk dixurîne, dişewitîne û dizixtikîne. |
| Koppleri | Qewadî | Yê ku tesîrekê li hinan dike ku seksê bi peran bike, an jî bi xwe jê peran qezenc bike. |
| Krama | Hemêzkirin | Gava mirov milên xwe li mirovek din digerîne û laşên xwe bi ser hev de didewisîne. |
| Kroppsvätska | Şilahiya laşî | Tiştekî şil ku ji laşî tê. Wek nimûne ev dikare xwîn be, avik be, rûn an avika şehwetê be. |
| KSK (kvinnor som har sex med kvinnor) | Jinên ku bi jinan re seksê dikin | Ev tarîfa ên ku xwe wek jin dibînin û bi jinan re seksê dikin. |
| KUB-test | Tahlîla KUB | Tahlîla xwînê û ya ultrasiyonê ku bi pitika di zikê ya avis de kontrol dike. |
| Kuk | Kîr | Organê mêr ê cinsî. Bi gelemperî gotinek ji ya penîs qabatir tê. |
| Kurator | Şîretkar | Alîkariya mirovên ku xwe ne baş his dikin dike. Bi riya axaftina alîkar. Kurator li nexweşxane û dibistanan dixebitin. |

| GOTINÊ SWÊDÎ | WERGER | ŞIROVE |
|---|---|---|
| Kvinnofrids kränkning | Bi sînorkirina azadiya jinê | Gava zilamek, jina ku pê re dijî, bi awayekî sîstematîk tade û neheqiyê lê dike. Wek nimûne, lêdixe, wê mecbûrî seksê dike, stemkariya psîkolojîk lê dike, an jî azadiya wê ya derketina derve bi sînor dike. |
| Kvinnojour, tjejjour | Alîkariya keç û jinan | Rêxistinek ku alîkariya jinan û transkesên ku tade li wan hatiye û ji aliyê ên nêzîkî xwe ve tûşî şidetê bûne, dike. Wek nimûne, gava tehdît li ser jinekê hebe, jê re xaniyekî parastinê tê temînkirin. |
| Kvinnoklinik | Klînîka jinan | Navendeke ku tedawiya nexweşên xwedî malzarok dike. Ên avis dikarin serî li vê navendê bidin û bi ultrasyonê kontrola pitika xwe bikin. Navendên weha li piraniya nexweşxaneyên mezin hene. |
| Kyssa | Maç | Gava mirov devê hev maçî dike û dike ku di eynî demê de zimanê mirov jî bi hev bibin. |
| Kåt | Bi şehwet | Hiseke di laş de ye ku mirov dixwaze bi xwe re an bi hinin din re seksê bike. |
| Känna olust | Nexwestin | Gava tiştek bi mirov xweş nayê û zewqekê nade mirov. |
| Kön | Cins | Cins tê maneya jin an mêr. Herweha dikare were maneya organê cinsî jî. |
| Könsbaserat våld | Şideta cinsî | Şideta li dijî jinê û li dijî mirovên hbtq. Bi piranî tê maneya şideta cinsî û istismara cinsî. Li *bi armanca seksê bazirganiya mirovî, şideta cotî, bisînorkirina azadiya jinê û rêxistinên alîkariya keç û jinan binêrin*. Herweha *li tacîza seksî* û *li kiryarên bi zerar jî binêrin.* |

| GOTINÊ SWÊDÎ | WERGER | ŞIROVE |
|---|---|---|
| Könsbekräftande behandling | Tedawiya esehkirina cinsiyetê | Tedawiyeke laşî ye da ku cinsiyeta mirovekî eseh bike, wek mêr, jin an jî cotcinsî. Ev tedawî wek nimûne dikare organa cinsî emeliyat bike an jî hormoninan bigire da şiklê laşî biguhere. Gelek mirovên trans, lê ne hemû, dixwazin tedawiya esehkirina cinsyetê bibînin. |
| Könsdysfori | Nasnava zayendî | Dîagnoseke ku nîşan dide ku laşê mirov li nasnava mirov ya zayendî nake û loma êşê dikişîne. Mirovekî/miroveke weha dikare daxwaza tedawiya tesdîqkirina cinsiyetê bike. |
| Könsidentitet | Nasnameya zayendî | Ew zayenda ku mirov bi xwe, xwe aîdê wê dibîne. Tu têkiliya *nasnameya zayendî* bi helwesta zayendî re nîne. |
| Könsorgan | Organên cinsî | Beşên laşî ên ji navê û berjêr, wek kîr û quz. |
| Könssjukdom | Nexweşiyên cinsî | Îltihabeke ku gava yek bêyî xweparastinê bi yekî/yeka ku nexweşiyeke cinsî pê re heye seksê dike. |
| Könsstympning | Sunetkirina keçan | Gava zîlik tê jêkirin û an jî tê birîndarkirin. Carina lêvên quz ên derveyî û hundirîn jî tê birîn û paşê qelîşteka quz bi hev ve tê dirûtin. Ev wek sûcekî mezin yê mirovatiyê tê dîtin û lê Swêdê qedexe ye. Herweha qedexe ye ku mirov hewl bide, plan bike, hazirîyê bike ku keçekê an jinekê ji bo sunetkirinê bibe welatekî din. Ev kirin wek sunetkirina jinê tê naskirin. |

| GOTINÊ SWÊDÎ | WERGER | ŞIROVE |
|---|---|---|
| Könsutredning | Lêkolînên zayendî | Ev lêkolîneke weha ye ku lêdikole ka bê mirovek bêyî perakî bide mafê wî/wê heye tedawiya tesdîqkirina zayendî bike an na. Hemû kesên ku dîagnosa nasnava zayendî werdigirin, mafê wan yê wergirtina vê alîkariyê heye. Dîagnos li nexweşxanê ji aliyê tîmeke pispor ve tê destnîşankirin. |
| Lesbisk | Lezbiyen | Gotineke adetî ye ji bo jineke homoseksuel. Herweha wek *flata* jî tê zanîn. |
| Ligga | Nîhandin | Gava mirov bi yekî/yekê an jî bi gelek kesan re seksê dike. |
| Livmoder | Malzarok | Beşek ji quz e ku di hundirê laşî de, di zik de ye. Di dema avisiyê de dol, pitik di vir de ye. |
| Livmoderhals | Qirika malzarokê | Jêra malzarokê-wir ziravtirîn beşa malzarokê ye. Qirika malzarokê li stûyê malzarokê bi dawî dibe. |
| Livmodertapp | Stûyê malzarokê | Beşa malzarokê ku di quz re rê dibe malzarokê. |
| Lubrikation | Şilbûyîn | Ew şilahiya quz e ku gava jinek tê şehwetê û seksê dixwaze. |
| Lustgas | Gaza bêhnkişandinê | Formeke daxistina êşê ye. Mirov ji ber êşa xwe dikişîne hinavên xwe. Bi taybetî jî ev di dema zayînê de (zarokanînê) de tê bikaranîn. |
| Läkare | Doktor | Yê ku dixebite da nexweş û birîndaran baş bike û pêşî li nexweşiyan bigire. |
| Mammografi | Mamografî | Bi ultrasiyonê kontrola singê ye, da hebûna kîst û tumorê keşif bike. |

| GOTINÊ SWÊDÎ | WERGER | ŞIROVE |
|---|---|---|
| Mansmottagning | Navenda mêran | Hemû kesên xwe wek mêr dibînin û ên bi kîr in dikarin ji bo alîkarî, piştgirî û axaftinê biçin vê navendê. Ev navenda mêran berî her tiştî bi karê seksê û têkiliyan ve mijûl e. |
| Mellangård | Baxçeyê navîn | Herêma di navbera zotikê û quz de, an zotikê û kîr de |
| Mens | Serê mehê, adet, mens | Xwîna ku ji malzarokê di quz re diherike. Piştî kamilbûnê di zik hev de ji mehê carekê tê. |
| Menskopp | Tasika mensê | Parastineke ku mirov dikare di dema mensê de bi kar bîne. Mirov vê tasika mensê di quz de bi cih dike û xwîna mensê li wir dicive ser hev. |
| Mensvärk | Êşa mensê | Êşeke ku di dema mensê de xwe dide der. |
| Missfall | Jiberçûyin | Gava hê berî zarok çêbibe zarok ji ber diçe. |
| Monoamorös | Yekzewceyî, monogam | Mirovek yekzewceyî tenê dixwaze bi yekî/yekê re bimîne. |
| Monogam relation | Têkiliya monogamî | Ew mirovên ku li ser vê têkiliyê li hev kirine, divê ew ji derveyî ferê/fera xwe bi kesin din re têkiliyeke cinsî daneynin. |
| MSM (män som har sex med män) | MSM (Mêrên bi mêran re seksê dikin ) | Tarîfek e ji bo kesên ku xwe wek mêr dibînin û bi mêran re seksê dikin. |


| GOTINÊ SWÊDÎ | WERGER | ŞIROVE |
| --- | --- | --- |
| Mykoplasma genitalium | Mykoplasma genitalium | *Mykoplasma* mîqrobeke ku dike organên cinsî bixure û ji kîr û quz tîrav biherike. Herweha êş dikare xwe di binê zik de, an di gun de jî nîşan bide. |
| Myom | Miyom | Tumorek çê dikare di hûnandina masulkên malzarokê de derkeve. Miyom pir adetî ye. Nêzîkî nîvê ên ku bi mensê dikevin miyom bi wan re heye. |
| Månggifte | Pirzewacî | Gava yek bi pir kesan re dizewice. Li Swêdê destûra pirzewaciyê tuneye. Navê vî sûcî *bîgamî* ye. |
| Människohandel för sexuella ändamål | Taciriya mirovan ya bi armanca cinsî | Gava mirov mirovekî/mırovekê tîne, dibe, an jî dişîne cihekî da ew mirov karê seksê pêk bîne. |
| Nedsatt sexlust | Kêmbûna daxwaza seksê | Gava mirov seksê naxwaze, an jî gava mîna berê daxwaz seksê li ba mirov namîne. |
| Njuta | Zewqstendin, şabûn | Gava tiştek xweş e û zewqdar e. |
| Ollon | Gupik | Beşek ji kîr e. Gupik li serê kîr e û di kîr de devera herî hesas e. |
| Omskärelse | Omskärelse Sunet | Gava hemû çerm an jî hin ji çermê kîrî tê jêkirin. Ev gotina ha carina ji bo sunetkirina jinê jî tê bikaranîn. |





RFSU – FIGHTING FOR BODY RIGHTS SINCE 1933

# WÊNE


## Kurmancî


GUPIKA KÎRÎ
BORÎYA MÎZÊ
BENIK
ÇERMIK
GUN
QULA QÛNÊ






ÇERMIK
GUPIKA ZÎLIKÊ
BORÎYA MÎZÊ
DEVÊ QUZÎ
DESTIKA QUZÎ
LÊVÊN HUNDIR
LÊVEN DERVE
QULA QÛNÊ






RÊYA HÊKÊ
HÊKDANK
MALZAROK
MÎZDANK
VAJÎNA/QUZ
BORÎYA
MÎZÊ
RÛVÎYA
DAWÎN
ZÎLIK
LÊVÊN QUZÎ
DEVÊ QUZÎ


GUPIKA ZÎLIKÊ
DESTIKÊN ZÎLIKÊ
ZÎLIK
PARÇEYÊN ZÎLIKÊ






MALZAROK
RÊYA HÊKÊ
VAJÎNA
/QUZ
HÊKDANK
STÛYÊ MALZAROKÊ



RÊYA AVIKÊ
KÎSIKÊ AVIKÊ
PROSTAT
KÎR
TOPIKA WERMÊ
BORÎYA MÎZÊ
GUPIK
RÊYA MÎZÊ
MÎZDANK
RÛVÎYA DAWÎN
SERHÊLIK
HÊLIKA GUNÎ/ GUNIK
GUN


GUPIKA KÎRÎ
DESTIKÊ KÎRÎ
TOPIKÊN WERMÊ
TOPIKA WERMÊ



TOPIKA WERMÊ
BORÎYA MÎZÊ
TOPIKA WERMÊ


RÊYA AVIKÊ
KÎSIKÊ AVIKÊ
PROSTAT
BORÎYA MÎZÊ
HÊLIKA GUNÎ /GUNIK







NE SINET KIRÎ



SINET KIRÎ



SINET KIRÎ




SINET KIRÎ




BÊ ŞEHWET




BI ŞEHWET




NE SINET KIRÎ



SINET KIRÎ



BÊ ŞEHWET



BI ŞEHWET

## PERWERDA SEKSÊ

Perwerdek seksê ya li ser bingehê zanyarî hatî ava kirin, wekheviyê berfireh dike. Perwerda seksê ya baş divê agehîyê çêbikê, ku çawa laş di xebitê, zewq çîye, seksualîte û hevbeşîya herî baş çîye û sohbetên têkilîyê û hiskirinê û tiştên din vekê.

## LÊNÊRÎNA SIHETÎ Û TENDURUSTÎYEK BAŞ

Esasê seksualîteyêk û nûkirina baş û wekhev di jîyanê de, ewe ku her kes heqê lênêrîna sihetî û tendurustîyê hebê. Siheta seksualîteyê û nûkirinê îro di Swêdê de, ne bi heqî belav kirîye. Zanyarîa li ser seksualîteyê divê beşek navendî be di lênêrîna sihetî û tendurustîyê, heta ku hemi pêwîstîyên cuda bên wergirtin.

## XEBAT BIKE – BIBE ENDAM

RFSU organîzasyonek endamekî ye ku tu bikarî netewî û navneteweyî tevlî mijara bibî. Li vir bêtir ser RFSU bixwîne: rfsu.se
Li vir tu dikarî enformasyon bi gelek zimana bibînî: rfsu.se/upos

RFSU 2019 • Illustrationer: Vendela Hellstrand & Stina Lundberg • Grafisk form: Stina Lundberg

rfsu.se • 08-692 07 00 • info@rfsu.se

| GOTINÊ SWÊDÎ | WERGER | ŞIROVE |
|---|---|---|
| Onanera | Lixwexweşanîn | Mirov seksê bi xwe re dike. Di lixwexweşanînê de mirov bi organê xwe ê cinsî, qûna xwe, an jî beşin din ên laşê xwe mist dide. |
| Oralsex | Oral seks (seksa devî) | Gava mirov bi devê xwe seksê dike, bi riya maçîkirin, alastin û mêtina organên cinsî, an jî alastina zotikê. Jê re herweha seksa devî tê gotin. |
| Orgasm | Orgazm | Hiseke xweş ku di dema seksê de, gava mirov xwe bi xwe, an bi hinin din re dike tê. *Orgazm* dike ku masulkên li dor organa cinsî tên hev. |
| Orgasmstörningar | Nexweşiyên orgazmî | Gava mirov zû an dereng orgasm dibe, gava mirov kêm an jî qet vala nabe. Gava *nexweşiyên orgazmî* bi mirov re hebe hingî orgazm dikare naxoş û an jî pir qels be. |
| Orosanmälan | Gilîkirina xemdariyê | Gava mirov ji ber gumana/şik ku zarokek pêrgî eziyetê tê li ba sosyalê gilî dike. Mamoste, doktor, an jî mamosteyên pêşdibistanî ku gumana ku eziyet li zarokên di binê 18 salî re tê kirin bikin, hingî ew mecbûr in ku haya sosyalê bigihînînê. |
| Oskuldskontroll | Kontrola bakîretiyê | Gava yek dibêje ka gelo keçikekê bi hinan re seks kiriye an na, nabe ku bi tibî kirineke weha destnîşan bike. Personalên nexweşxanê nikarin kontrola keçikek weha bikin û destûra wan nîne ku di vê mijarê de belgenameyekê binivîsin. Heke ev bi riza yekî be jî. Heke kontrol bêyî riza keçikê bibe, hingî dibe tacîz. |

| GOTINÊ SWÊDÎ | WERGER | ŞIROVE |
|---|---|---|
| Otrohet | Xiyanet | Gava mirov ji derveyî yê/ya ku mirov pê re ye bi hinin din re seksê dike. |
| Oönskad graviditet | Avistiyek bêhemdî | Gava mirov naxwaze lê dîsa jî avis dibe. |
| Partner | Cot | Yekî/yeka ku têkiliyeke mirov pê re heye, cinsiyet çi dibe bila bibe. |
| Partnervåld<br>(mäns våld mot kvinnor i parrelation och våld i nära parrelationer) | Şideta cotan<br>(di jin û mêrîtiyê de şideta mêran ya li ser jinan û şideta têkiliyên nêzîk) | Gava ji du kesên ku têkiliyeke wan ya evînî heye, yek zilma fizîkî, an jî ya psîkolojîkî li ya/yê din dike. |
| Penis | Penîs, kîr | Organê mêr ê cinsî. |
| Perineum | Perineum | Herêma di navbera zotikê û quz de û zotikê gun de. |
| Personlig integritet | Yekseriya kesane | *Li wêneyên seksuel ên belavbûyî û reşkirinê binêre* |
| Pessar | Pessar<br>(Rehimbend) | Tasikek biçûk ya ji silîkonê ku mirov di quz de bi cih dike, li jora devê stûyê malzorê. *Pessar* digel jelê tê bikaranîn. *Pessar* alaveke dijavisiyê ye. |
| Pojkvän | Lawikê heval | Xortekî ku têkiliyeke mirov ya pevrebûnê pê re heye. |
| Polyamorös | Polyamori | Mirovek ku dikare di eynî demê de bala xwe berde ser çend kesan û ji çend kesan bi hev re hez bike. |
| Pornografi, porr | Pornografî, por | Wêne û fîlmên seksê ku armanca wan ew e yên temaşevan şor bike û wan bîne şehwetê. Herweha jê re por jî tê gotin. |

| GOTINÊ SWÊDÎ | WERGER | ŞIROVE |
|---|---|---|
| P-piller | P-piller (Hebikên P) | Hebek e kesa ku bi malzarok e rojekê carekê dixwe da ew avis nebe. Hebên cihêreng hene. P-piller alaveke dijavisiyê ye û celebên wê ên cihê hene. |
| P-plåster | Banda P | Bandeke ku bi laşê yeka bi malzarok ve tê zeliqandin û piştî hefteyekê tê guhertin. Banda p alaveke dijavisiyê ye ku ji avisbûnê re dibe asteng. |
| P-punktsområdet | Herêma nixteya P | Herêmeke ku hinekî di qûnê de ye. Nêzîkî prostatê ye û ji bo mistdanê hesas e. |
| Prematur ejakulation | Zû valabûn | Gava mirov bêyî daxwaz xwe zû vala dibe. Ev dikare ji mirov bi xwe re, an jî ji fera (partnera) mirov re bibe pirsgirêk. |
| Premenstruellt dysforiskt syndrom, (PMDS) | Sendroma Premenstruellt dîsfori, (PMDS) | Formeke ji PMSê zehmettir e. Nîşanên wê bi piranî psîkolojîk û bi fikar e. Nîşanên din jî ew in halîyetî ruhuyeta mirov diguhere û mirov diwestîne. |
| Premenstruellt syndrom, (PMS) | Sendroma Premenstruell, (PMS) | Êşên fizîkî û psîkolojîkî berî ku mirov têkeve kirasan (xwina mirov were) bi çend rojan xwe nîşan didin. Wek nimûne êşa sîngê, serêşî, guhertina ruhuyetê, kêmbûna enerjiyê û acizî. |
| PrEP | PrEP | Dermaneke ku mirov ji bo kêmkirina rîska nexweşiya Hivê bi kar tîne. |
| Preventivmedel | Alava xweparastina bo avisiyê | *Alavê dijavisiyê* ji bo ên ku dixwazin bi kîr di quz de seksê bikin. Nimûneyên *alavê dijavisiyê* kondom, p-piller an jî spîral e. Kondom yekane alava dijavisyê ku hem avis nake hem jî ji nexweşiyên cinsî diparêze. |

| GOTINÊ SWÊDÎ | WERGER | ŞIROVE |
|---|---|---|
| P-ring | Xeleka P | Xeleka p alaveke dijavisyê ye ku pêşiyê li avisbûnê digire. Plastîkeke nerm e ku mirov bi xwe di quz de bi cih dike. |
| Prostata | Prostat | Organek e ku di laşê mirovên xwedîkîr de heye. Ew di navbera boriya mîzê û roviya dawî de ye. Ew hinekî ji wê avika ku gava ji mirov diçe hildiberîne. |
| Prostata-undersökning | Kontrola prostatê | Ev kontroleke weha ye ku an bi riya roviya dawî dibe an jî bi riya prova xwînê. |
| Prostatit | Prostatit | Îltihaba organa prostatê. Forma adetî prostata kronîk e. |
| Prostitution | Fuhûş, xwefirotin | *Li seksa bi peran binêre.* |
| P-spruta | Derziya-p | Miroveke xwedî malzarok ji sê mehan carekê vê derziyê li xwe dixe. *Derziya-p* alaveke dijavisiyê ku ji avisbûnê re dibe asteng. |
| P-stav | Darikê p | Darikekî/textikekî nermik î ji plastîkê ye ku dixe binê çermê jora milê ya bi malzarok da ku pêşî li avisbûnê bigire. *Darikê p* alaveke dijavisiyê ye ku ji avisbûnê re dibe asteng. |
| Psykiatriker | Psîkîyater | Doktorek ku pisporê rewşa mirovî û nexweşiyên psîkolojîk e. |
| Psykolog | Psîkolog | Bi siheta psîkolojîk re dixebite. Wek nimûne dikare alîkariya mirovên ku ji aliyê psîkolojîk/nefsî ve ne rehet in bikin. Seredana psîkolog tê maneya ku diçe terapiyê. |
| Pubertet | Kamilbûn | Ew dema di jiyanê de ku laş ji zaroktî ber bi kamilbûnê ve hildikişe. Piranî ji 8 heta 13 salî balix dibin. |

| GOTINÊ SWÊDÎ | WERGER | ŞIROVE |
|---|---|---|
| Pubishår | Pirça balixbûnê | Pirça ku li ser û li dorberî organê cinsî tê. Herweha jê re berzik an rûv jî tê gotin. |
| Pulla | Bi riya quz lixwexweşanîn | Gotineke ku ji bo lixwexweşanîna bi riya quzî tê bikaranîn. Herweha dikare were maneya ku kesek din quz mist dide. |
| Pung | Gun | Kîsikekî ku bi binê kîr ve daliqiyayî ye. Di gunik de hêkik hene. |
| Pussa | Maç | Gava mirov lêvên xwe datîne ser lêvên hinin din, an jî ser laşê hinin din. |
| Queer | Queer | Mirovek *queer* li hemberî normên hetero şikdar e. Ev dikare bo meyla cinsî be, nasnameya zayendî be, an jî mirov dixwaze bi ên din çawa têkliyan deyne. Têgeheke ku gelek maneyên wê hene. |
| Rasism | Rasîzm | Helwest, nêrîn an jî hisên neyênî ên dijberî mirovên reş, an dijberî mirovên ku ji kok/ esil, kultur an jî dînekî din tê ku ne wek yê mirov bi xwe ye. |
| Rimming | Rimming | Alastina dorhêl û hundirê zotikê. |
| Runka | Lixwexweşanîn | Ev gotin ji bo lixwexweşanîna bi kîr e. Wek nimûne, ku mirov serê gupikê mist bide, an jî kîrê xwe di nav destê xwe de bibe û bîne. |
| Ryggbedövning | Tevizandina piştê | Tevizandineke ku ji bo gava jin dike bizê an jî gava mirov dike ji navê û berjêr emeliyat bibe. Jê re *epîdural* jî tê gotin. |

| GOTINÊ SWÊDÎ | WERGER | ŞIROVE |
|---|---|---|
| Sambo | Jiyana bi hev re | Kesek ku mirov bêyî zewicî be bi hev re bijî. |
| Samlag | Nîhandin | Gava mirov seksê dike. Nîhandin ew e ku gava kîr dikeve quz, an jî qûnê. |
| Samlagssmärta | Êşa nîhandinêsexual | Êşa ku di dema nîhandinê de xwe dide der.  Ew êş dikare xwe di gilikê, quz, kîr, gunik, hêkên gunik, an jî di laş de xwe bide der. |
| Samlagsställning | Pozisyonên nîhandinê | Awayê ku mirov laş digihîne hev gava mirov seksê dike. Herweha jê re *pozisyonên* seksê jî tê gotin. |
| Sesammottagning | Navenda Sesamê | Navendeke ku mirov dikare li wir testa nexweşiyên cinsî bike û tedawiyê bibîne. Li wir şêwirmendiya alavên dij avisbûnê û ya têkiliyên seksê jî heye. |
| Sex | Seks | Gava mirov tiştekî dike ku xweş e. Mirov dikare hem bi xwe re seksê bike, hem jî bi mirovên din re. Hin nimûneyên ji seksê ew in ku mirov an bi hinan radizê, an jî xwe bi xwe mist bide û li xwe xweş tîne. |
| Sexdebut | Seksa destpêkê | Seksa destpêkê tê wê maneyê ku mirov cara pêşî bi hinan re seksê dike. |
| Sexism | Seksîzm | Helwest, nêrîn an jî hisên neyînî ên li dijî jinan û ên ku wek jinan tên dîtin. Dikare xwe bispêre pêşbînîyê, nefretê, hêrsê û şidetê ku li ser bingehê desthilatdarî û norman hatiye avakirin. |

| GOTINÊ SWÊDÎ | WERGER | ŞIROVE |
| --- | --- | --- |
| Sexköp | Kirînê seksê | Gava mirov alavekî dide hinan da ew wê digel, an li dij hinan di warê seksê de bi karî bînin. Kirîna seksê bêqanûnî ye, lê firotina wê ne bêqanûnî ye. |
| Sexleksak | Lîstokê sekse | Alavek ku mirov pê seksê dike, an bi tena serê xwe, an jî digel hinin din. Wek nimûne dîldo, xeleka kîr, an vîbrator. |
| Sex mot ersättning | Firotina sekse | *Li kirîna seksê ya ji qewadan binêre.* |
| Sexolog | Seksolog | Bi axaftinên piştgir ên di derbarê seksê û problemên têkiliyan de dixebite. |
| Sexställning | Awayê sekse, pozisyona sekse | Gava mirov seksê dike, pozisyonên ku mirov laşên xwe dixiyê. Herweha jê re dibêjin celebê bihevrerazanê jî. |
| Sexuell läggning | Hewesdariya seksuel | Ev gotina tarîfa zayenda kesên ku mirov evîndar dibe an jî pê re seksê dike. Hewesdariya seksuel dikare heteroseksuelî, homoseksuelî û bîseksuelî be. Ev hersê jî di qanûna cûdakariyê de hene. |
| Sexuell praktik | Pratîka seksuel | Celebên cihê ku mirov pê seksê dike. Wek nimûne; xwelihevboqandin, mistdan, lixwexweşanîn û nîhandina quz. |
| Sexuella fantasier | Fantaziyên sekse | Fikir û xeyalên bi naverokên seksî. |

| GOTINÊ SWÊDÎ | WERGER | ŞIROVE |
|---|---|---|
| Sexuella trakasserier | Tacîza seksuel | Gava yek hewl dide ku seksuel tadê li yekî/yeka din dike. Bo nimûne, li cihê kar, an jî li dibistanê. Kardar û dibistan jê berpirsiyar e ku pêşî li kirinên weha bigire. Sendîqa alîkariya kesên ku li cihê kar pêrgî vê binpêkirinê tê dike. Herweha li *istismara seksê* jî binêre. |
| Sexuella övergrepp | Istismara seksî | Gava mirov kirineke seksî li dijî hinan bêyî riza wan dike. Wek nimûne, ku mirov wêne bigire, an bêyî daxwaza kesî dest biavêjê. Ev kirin te divê bi naverokek şidetî be, an jî yê ku dike, nas bike, an jî zewicî bin. Li *tecawizê*, *êrîşên seksî* û *tacîzên seksî binêre*. |
| Sexuella övergrepp mot barn | Tacîza seksî ya li zarokan | Li Swêdê zarokek di bin 15an re nikare bi riza xwe di mijara seksê de bide û bistîne, loma, gava ew ji aliyê ên kamil de têkiliyî seksê dibin û temenê wan di binê 15an re be, dibe tacîza seksî. Armanc ew e ku zarokan di warê seksê de ji mezinan biparêze. Lê belê, zarokên di binê 15an re gava ji bo keşifkira jiyana xwe ya sekê bi hev re li ser daxwaza xwe dikevin têkiliyê, hingî ne sûc e. Li *tecawiza zarokan, bikaranîna zarokan ji bo seksê, seksa bi daxwaz gava yê/ya dike di bin 15an re ye, sûcê pornografiya zarokan, şideta li dijî zarokan, ensest, kontrola bakîretiyê û grooming* bixwîne. |
| Sexuellt ofredande | Êrîşên seksî | Gava mirov bi hinan re tiştên seksî dike ku ew bi xwe naxwazin. Wek nimûne, gava mirov dest davêje hinan, organên xwe ên cinsî an di rastiyê de nîşan dide an jî li ser înternetê nîşan dide. Li *şideta seksî* binêrin. |

| GOTINÊ SWÊDÎ | WERGER | ŞIROVE |
|---|---|---|
| Sexuellt utnyttjande av barn | Bikaranîna seksê ya bi zarokan re | Gava yek bi zarokek di bin 15 salî re radizê, an zarokê bi armanca seksê bi kar tîne, ne bi qasî tecawizê cidî ye. Wek nimûne, gava yek bi kesek di bin 15 salî re, lê bi riza zarokê pê re seksê dike. |
| Sexuellt övergrepp | Tacîza seksî | Gava hin li hinin din kirineke seksî pêk tîne ku ew ne bi dilê xwe dike û ku ew kirina seksî ne qanûnî ye û biçûkxistineke welê ye ku mîna tecawizê ye. Li *tecawizê* binêre. |
| Singel | Singel, bi tenê | Yê/ya ku bêyî têkiliyek evînî ye. |
| Sjuksköterska | Hemşîre | Bi karê pratîkî û klînîkî bi armanca sihet û lênêrîna nexweşan re dixebite. Gelek versiyonên karê hemşîreyan hene, ka bê wan di kîjan warî de perwerdeya xwe dîtine. |
| Skadliga sedvänjor | Kirinên bi zerar | Hin adetên wek midaxeleyên tibî, an jî li Swêdê zewacên bêqanûnî, bi gelemperî bi keç û jinan re. Ev wek binpêkirina mafên mirovan û şidetê tê dîtin. Li *bindestiya xwe dispêre namûsê*, *sunetkirina jinan*, *zewaca bi zorê, zewaca zarokan* û *pirzewaciyê binêre*. |
| Skilja sig | Berdan | Gava mirov dawiyê li zewacekê tîne. Gava mirov hev berdide, êdî mirov ne zewicî ye. Herdu jî dikarin ji bo hevberdanê serlêdanê bikin lê hewce nake mirov ji bo hevberdanê di eynî fikrê de be. |
| Skilsmässa | Hevberdan | Ji bo ku mirov nema dixwaze di zewacekê de bimîne, mirov hevdu berdide. Mafê her kesî heye ku ji bo hevberdanê serlêdanê bike. Ji bo hevbardanê têr dike ku yek ji cotan daxwaz bike. |

| GOTINÊ SWÊDÎ | WERGER | ŞIROVE |
|---|---|---|
| Slemhinna | Tenikçerm | Çermê tenik û şil di deverên vekirî ên laşê mirov de. Wek nimûne; quz, boriya mîzê, zotik, dev û di binê çermê sunetê de. |
| Slida | Qelîşteka quz | Qelîşteka quz ku tê re kirasê, spî û sor xwe tê re dide der. Di zayina quzî de bebek tê re tê der. |
| Slidkrans | Destika quz | Qorziyek çermikê zirav û şil yê lihevbadayî ye. Destika quz hinekî di hundirê quzî de ye. |
| Smeka | Mistdan | Gava mirov xwe bi xwe an hinin din bi destan mist dide. |
| Smeksex | Seksa mistdanê | Seksa ku mirov bi destan organên xwe an ên hev mist dide. |
| Smittskydd | Parastina li dij têwerdanê | Dewlet ji berlêgirtina belavbûna nexweşiyên mîna hîv, klamîdya, gonorê û syfîlîs berpirsiyar e. Ev tê wê maneyê ku divê hin gavên pêwîst ji bo nexweşên ku tedawî dibin bêne avêtin. Li *qanûna nexweşiya enfekiyonê, karûbarê agahdariyê û şertên enfeksiyonê binêre.* |
| Smittskyddslagen | Qanûna nexweşiyên jihevvegir | Qanûneke ku wê pêşiyê li nexweşiyên jihevvegir mîna klamidya, gonorê, hiv û syfîlîs bigire da ew zêde belav nebe. Qanûna nexweşiyên jihevvegir dibêje, herkes ji bo nexweşiyên cinsî xwediyê wî mafî ye xwe belaş test bike. Herweha ên ku bi nexweşiyê jî ketine wê belaş werin tedawîkirin. Dewlet ji belavbûna nexweşiyên welê berpirsiyar e. |
| Smittspårning | Şopandina têkiliyê | Mirovek ku encama testa wî/wê ji bo hin enfeksiyonan pozîtîf be, wek nimûne klamidya an jî hîv, divê ji personalan re bibêje ka bê ew bi kê re ketiye têkiliya seksî da ew mirov jî îmkana testkirina xwe bibîne. |

| GOTINÊ SWÊDÎ | WERGER | ŞIROVE |
|---|---|---|
| Smärtlindring | Êşdaxistin | Dermanekî ku êşa mirov kêmtir dike. |
| Snippa | Quz | Navê organa keçikan ya cinsî. |
| Snopp | Kîr | Nava organa lawikan yê cinsî. |
| Sperma | Avik | Avika ku di dema valabûnê de ji kîr diherike û bi naveroka spermî ye. |
| Spiral | Spîral | Di hundirê quz de derbas dibe û di malzorê de tê bicihkirin. Du celebên *spîralê* hene, *yek jê ya hormonî ye ya din jî ji sifir e.* Spîral alaveke dijavisiyê ye ku ji avisbûnê re dibe asteng. |
| Sprida sexuella bilder på andra | Belavkirina wêneyên hinin din ên seksuel | Gava mirov wêneyê hinan ên seksê bêyî riza wan belav bike sûc e. Ferq nake ku ew wêne bi daxwaz hatibin şandin an jî bi dizî hatibin girtin. Bi qanûnî dikare wek sûcdarî û pêşbînî were qebûlkirin. Gava mirov bêyî haya hinan wêneyê wan bigire, we nimûne li odeyek kincguhertinê, odeyek kincceribandinê, li tualetê, an jî li malê bi qanûnî dikare wek *wênegitina îhlalkirin* bête qebûlkirin. |
| Steril | Stewrî | Gava yek nikare avis bibe an hinin din avis bike. |
| Sterilisering | Xesandin | Emeliyateke ku dike yek nikare avis bibe an hinin din avis bike. |
| Sträng | Çermik | Çermê di navbera gupikê û qevda kîr de ye. Herweha wek *frenulum* jî tê zanîn. |

| GOTINÊ SWÊDÎ | WERGER | ŞIROVE |
|---|---|---|
| Stånd | Repbûn | Gava kîr an zîlika qûz bi xwînê dagirtin, ji hev dikişe û rep dibe. Herweha wek *ereksiyon* jî tê zanîn. |
| Svampinfektion i underlivet | Îltihaba kuvarkî | Îltihabeke welê ye gava kuvarkeke hêvanî di hundir an li der û dora quz tê. Semtomên wan dikare xura di hundir an derûdora quzî be, an jî ew der sor dibin û mukoz diwerimin, herweha tîraveke spî jê diherike. |
| Svällkropp | Berfirehkirina bedenî | Di hundirê organa cinsî de celebek hûnandina laşî ye. Berfirehkirina bedenî hem di kîr de heye hem jî di gilikê (klîtorîsê) de heye. |
| Syfilis | Fregî, Sifilis | *Syfîlîs* nexweşiyeke cinsî ye ku geleke caran laş pê nahese, li birînên hûrik dikare di cihê nexweşî derbas bûyê de derkeve. *Syfiliksek* ne tadawîkirî dikare piştî bi salan bibe sebeba nexweşiyên dil û sîstema sinir. Dikare bi antîbîyotîkayê were tedawîkirin. Syfîlîs jî daxilî qanûnên jihevvegirtê ye. |
| Sädesblåsa | Torbekê tov | Beşek ji organên cinsî ên hundirîn ku kîrê mirov hebe. *Torbekê tov* di hundirê laşî de li pişt kîsikê mîzê de ye. |
| Sädesledare | Rêberê tov | Beşek ji kîr, organên hundir. Gava ji mirov diçe, bi riya *Rêbertiya tov* avik derbasî boriya mîzê dibe. |
| Säkra perioder | Demên eseh | Demên eseh ew dem in ku gava mirov bi hev re radizê rîska bi zarobûnê pir hindik e. |
| Säkrare sex | Seksa êmin | Seksa bi kondomê an jî sekseke weha ku kê rîskeke kêm an jî qet rîska derbasiya nexweşiyên cinsî nahundurîne. |

RFSU – FIGHTING FOR BODY RIGHTS SINCE 1933

| GOTINÊ SWÊDÎ | WERGER | ŞIROVE |
|---|---|---|
| Tafsning | Destavêtinî | Gava yek dest davêje yê din bêyî ku bi riza wî/wê be. Bo nimûne gava dest davêje qûnê, memikan, çîman, an jî organên cinsî. Destavêtinî bêqanûnî ye û wek istismara seksî tê qebûlkirin. Li *tacîzkirina seksî* û zordariya cinsî binêre. |
| Tampong | Tampon | Parastineke ku di dema mensê de tê bikaranîn. Tampon di quzî de tête bi cih kirin û ji wir xwînê dimêje. |
| Testa sig | Xwetestkirin | Provê ji dev, ji quz û ji qûnê hildigire da bizane ka nexweşiyeke cinsî heye an na. Herweha ev prov ji mîzê û ji xwînê jî tê girtin. |
| Testikel | Gun | Aîdê organên cinsî yê hundir e ku kîrê mirov hebe. Hêkik di gun de heye. Ew spermîe û hormonên din dihilberîne. |
| Testikelvridning | Zîvirandina hêka gun | Gava hêka gun di gun de dizîvire. |
| Tidig utlösning | Zû valabûn | Dema mirov seksê dike û pir zû ji mirov diçe.  Herweha wek *zûjêçûyin* jî tê binavkirin. |
| Tjatsex | Pitpita seksê | Gava yek ji mirovek din bi pitepit, daxwaz û mecbûrî seksê dike ku ew mirov naxwaze. *Pitpita seksê* ne li ser daxwaza dualî ye. |
| Transfobi | Transfobî | Nêrîn û helwestên neyînî ên li ser mirovên trans û bi giştî li dijî wan. Ev bi piranî li ser pêşbîniyê, neheqiyê, hêrs û şidetê ava dibe. |
| Transkvinna | Jina trans | Mirovek ku bi kîr hatiye dinyayê û bi hiqûqî wek ”mêr” derbas dibe, lê ew mirov di hundirê xwe de xwe jin dibîne. |

| GOTINÊ SWÊDÎ | WERGER | ŞIROVE |
|---|---|---|
| Transman | Mêrê trans | Miroveke ku gava hatiye dinyayê bi quz hatiye dinyayê û bi hiqûqî jî wek ”jin” e, lê ew xwe wek mêr his dike û dibîne. |
| Transperson | Transkes | Ger mirov trans be an jî kesekî trans be tê maneya ku mirov li dijî normên civatê ên ji bo cinsiyet û kesayetiya cinsî derdikeve. Ya hevpar ji bo kesên trans ew e ku kesayeta wan ya cinsî ne mîna ya ku gava di dema çêbûnê de li wan hatiye barkirin. Mirovên trans, mîna her kesî, dikare xwediyê cinsiyetê cihêreng bin. Herweha li *jina trans, mêrê trans* û *ên ne alî binêre*. |
| Trekant | Sêkoşe | Gava sê mirov bi hev re seksê dikin. |
| Tvångsäktenskap | Zewaca bi zorê | Gava yek bi zorê, tehdîdê û an bikaranîna daxwazê hinan mecbûrî zewacê bike. Ev li Swêdê bêqanûnî ye û di zimanê hiqûqî de jê re *zewaca bi zorê* tê gotin. |
| Tystnadsplikt | Nepenî | Gava mirov xwediyê berpirsiyariyekê be da agahdariyên heyî derbasî hinin din neke. Ev ji bo hin pîşeyan derbas dibe. Wek nimûne doktor, psîkolog, mamoste, keşe, ebûqat û polîs. |
| Tända på | Lêrabûn | Gava mirov li kesekî/kesekê an tiştekî radibe û dikeve şehwetê. |
| Ultraljud | Ultrasiyon | Tahlîleke ku ji bo wêneyên livok yê pitikê bigire. |
| Underliv | Navling | Organa cinsî, hem ji kîr, hem jî ji quz re navling tê gotin. |
| Undersköterska | Nexweşnêr | Li nexweşxanê bi karên pratîk ên lênêrîna nexweşan, bi kal û pîran re an jî bi mirovên li malên xwe hewcedarî alîkariyê re dixebite. |

| GOTINÊ SWÊDÎ | WERGER | ŞIROVE |
|---|---|---|
| Ungdoms-mottagning | Klînîka ciwanan | Ev klînîkeke weha ye ku mirovên di navbera 13 û 23 salî de (carina heta 25an) dikarin lê xwe test bikin, alavên dijavsiyê bistînin, agahdariyên li ser seksê wegirin û xwe terapî bikin. |
| Upphetsad | Şehwet, germbûyî | Hiseke di laşî de ku mirov seksê dixwaze, xwe bi xwe an bi hinin din re. |
| Urininkontinens | Xwenegirtina ji mîzê | Gava mirov nikare di dema mîzkirinê de xwe kontrol bike. Herweha mîna *bixwedemîzkirin* jî tê zanîn. |
| Urinrör | Boriya mîzê | Borîyeke zirav e, di organa cinsî de ye û dike ku em bikarin bimîzin. Mîz ji kîsikê mîzê ber bi borîka mîzê ve tête neqilkirin. |
| Urinvägsinfektion | Îltihaba boriya mîzê | Ev îltihabeke ku di hin beşên boriya mîzê de ye ku ji ber mîqroban bûye. Nîşanê adetî ew e ku gava mirov dimîze dişewitîne û zêde mîza mirov tê. |
| Urolog | Doktorê nexweşîyên rêya mîzê | Doktorekî ku pisporê nexweşiyên boriyên mîzê ye û bala wî li ser emeliyat û dermankirina nexweşiyên boriya mîzê hem ya kîr hem jî ya quzî ye. |
| Utlösning | Valabûn, jêçûn | Gava avik an tiştekî rohn ji kîr tê, bi gelemperî di dema orgasmê de. Gotineke din heye ku jê re dibêjin *sats*. Valabûn ew e jî gava di quz de avik ji kîr diçe. |
| Utomkveds-havandeskap | Avistiya derveyî | Xeletiyeke di dema avisbûnê de ku ew hêka meyandî dadikeve derveyî malzarokê. |
| Vaccination | Derzîkirin | Gava mirov xwe li dijî hin celebên nexweşiyan derzî dike. Ew derzî dike ku laş xwe li hember bo nimûne mîqrob û virusan biparêze. |

| GOTINÊ SWÊDÎ | WERGER | ŞIROVE |
|---|---|---|
| Vagina | Quz, vajîna | Organa jinê ya cinsî. Vajîna ew oragana e ku di hundirê laşî de ye. Lê bi piranî hem ji bo organa cinsî ya hundirîn û ya derveyîn tê bikaranîn. |
| Vaginal kondom | Kondoma quzî | Alaveke naylonî ye ku mirov dikare di quz de, an di qûnê de bi cih bike gava kîr dikeve quz an qûnê. |
| Vaginalsex | Seksa quzî | Gava mirov ji quz seksê dike. Wek nimûne bi tilîkan, bi lîstokek seksê an jî bi kîr. Herweha jê re *seksa quzî* jî tê gotin. |
| Vaginism | Vagîzîm | Gava mirov tiştekî radide quz û quz tê hev. Ev dikare tampong be, dikare kontroleke li ba jinekolog be, an jî dema bihevrerazanê an jî lixwexweşanînê be. Herweha jê re qolinca quzî jî tê gotin. |
| Vara gift | Zewicî | Gava yek bi yekî di ser 18 salî re dizewice. |
| Vara ihop | Bihevremayîn | Gava têkiliyeke evînî bi yekî din re hebe. |
| Vara kär | Evîndarî | Bi hisên xurt hezkirina yekî li hemberî yê din. |
| Vara tillsammans | Bihevrebûn | Gava têkiliya yekî bi riya evînê bi yekî/ yeka din re hebe. |
| Vattnet går | Av diçe | Gava zara pitikê diteqe û ava pitikê dest pê dike ji ya avis diherike der. |



RFSU – FIGHTING FOR BODY RIGHTS SINCE 1933

| GOTINÊ SWÊDÎ | WERGER | ŞIROVE |
|---|---|---|
| Venusberg | Berzik | Ew beşa bilind ya di ser quz re ye. |
| Vestibulit | Vulvodyni | Êşa li dorbera quz û hundirê quz. Gava quz ji hev vedibe bêtir diêşe. Herweha wek *vulvodyni* jî tê binavkirin. |
| Vulva | Lêva quz | Ew beşên derve ên vajîna. Ew beşên ku derdikeve derveyî laş. |
| Våldtäkt | Tecawiz | Tecawiz ew e ku gava yek bi zorê seksê an jî wek seksê bi kesekê re dike ku bêyî riza wê ye. Ev sûcek e. Herweha divê mirov seksê bi yeka razayî re û yeka ku pir di bin tesîra alkolê an jî drogerê de be. Herweha heke têkilî encama tehdît an jî şidetê be ew jî tecawiz e. Li t*acîza seksuel* û *tacîzên seksê* binêre. |
| Våldtäkt mot barn | Tecawiza zarokan | Gava yek bi zarokek di bin panzdehsalî re bi riya quz, dev, qûnê, an bi aletekê. Ferq nake ka bi daxwaza zarokê bûye an zarokê bi xwe gava pêşî avêtiye. Ev dikare bi riya înternetê jî be. *Bala xwe bide tecawiza li dijî zarokan.* |
| Vårdcentral | Navenda tenduristiyê | Ev navendeke welê ye ku gava mirov xwe nexweş his dike, ku mirov li wir berî her tiştî hemşîre û doktoran dibîne lê herweha mirov dikare li wir kurator û psîkologan jî bibîne. |
| Vårtgård | Xeleka serê memikê | Xeleka li dor serê memikê. Ew xelek ji memikê tarîtir e û ji çermên memikê ên din qermîçoktir e. |

| GOTINÊ SWÊDÎ | WERGER | ŞIROVE |
|---|---|---|
| Äggledare | Hêka rêberk | Organên tenik di forma borîkan de ku hêkikê bi malzarokê ve girê dide. |
| Ägglossning | Hêkkirin | *Hêkkirin* tarîfa pêvajoya gava hêkek ji hêkikê dikeve di riya hêka rêberk re xwe digihîne malzarokê. |
| Äggstock | Hêkik | Hundirê organên kesên bi malzarok. Du hêkik hene. Li vir meyla li ser hêkê heye. |
| Älska någon | Evîndarî | Gotineke hezkirinê ya dagirtî ye. |
| Ändring av juridiskt kön | Guhertina zayendî ya hiqûqî | Mirovek ku di ser 18 salan re ye û teşhîsa transseksueliyê wergirtiye, dikare ji bo guhertina cinseyata xwe ya hiqûqî serî li dezgeha Socialstyrelsenê bide û daxwaz guhertina zayenda xwe bike. Herweha li ser *xizmeta tesdîqkirina cinsî, lêpirsînên zayendî, astengiyên zayendî û mirovên veguherîn (trans)* bixwînin. |
| Ömsesidighet | Lihevkirî | Divê hemû kesên bi hev re seksê dikin, bi dixwaz û riza wan be û ji bo hemûyan xweş be. |
| Öppen relation | Têkiliya vekirî | Ev têkliyeke welê ye ku yên bi hev re ne li hev kirine ku ew dikarin herweha ji derveyî têkiliya xwe bi hinin din re jî razên û kêliyên romantîk bijîn. |

RFSU – FIGHTING FOR BODY RIGHTS SINCE 1933

ISBN 978-91-85188-67-3
RFSU 2019 • Illustrationer: Vendela Hellstrand & Stina Lundberg • Grafisk form: Stina Lundberg

## PERWERDA SEKSÊ

Perwerdek seksê ya li ser bingehê zanyarî hatî ava kirin, wekheviyê berfireh dike. Perwerda seksê ya baş divê agehîyê çêbikê, ku çawa laş di xebitê, zewq çîye, seksualîte û hevbeşîya herî baş çîye û sohbetên têkilîyê û hiskirinê û tiştên din vekê.

## LÊNÊRÎNA SIHETÎ Û TENDURUSTIYEK BAŞ

Esasê seksualîteyêk û nûkirina baş û wekhev di jîyanê de, ewe ku her kes heqê lênêrîna sihetî û tendurustîyê hebê. Siheta seksualîteyê û nûkirinê îro di Swêdê de, ne bi heqî belav kirîye. Zanyarîa li ser seksualîteyê divê beşek navendî be di lênêrîna sihetî û tendurustîyê, heta ku hemi pêwîstîyên cuda bên wergirtin.

## XEBAT BIKE – BIBE ENDAM

RFSU organîzasyonek endamekî ye ku tu bikarî netewî û navneteweyî tevlî mijara bibî. Li vir bêtir ser RFSU bixwîne: rfsu.se
Li vir tu dikarî enformasyon bi gelek zimana bibînî: rfsu.se/upos

rfsu

rfsu.se • 08-692 07 00 • info@rfsu.se